

GULAN 2022

# The Hall

KURDÎ

## SUNA ALAN

LI LONDONÊ AWAZEKE KURDÎ

HEVPEYVÎN: EROL BAŞAK

## HOGIR AR Û HÛNERA DÎJÎTAL

HEVPEYVÎN EROL BAŞAK

## ÇEND GOTIN LI SER ŞEHNAMEYA FÎRDEWSÎ

NECAT ZIVINGÎ

## GAZA KURDISTANÊ Û DERFETÊN NÛ

PROF. DR. ABDULLAH KIRAN

## MEDYA

SEÎDE PERDÎSIYAN

www.thehallkurdi.com

■

TheHallkurdî
E-kovara çandî ya mehane
Hejmar 5, Gulan 2022

■

**Damezrîner**
Osman Kömürcü
Erol Başak

■

**Editor**
Erol Başak

■

**Rûpelsazî**
Ridwan Xelîl
ridwanxelil@gmail.com

■

**Bergsazî**
GrafiKURD

■


Navnîşan
**London UK**

■

**The Hall Kurdî**
Endama Koma
Kovargerên Kurd e

■

www.thehallkurdi.com
thehallkurdi@gmail.com
+44 7915 413436
@KurdiHall
TheHallKurdi
The Hall Kurdî



*E-kovara The Hall Kurdî hesas e ku kovar di wextê xwe de bê weşandin.*
*Ji fikrên di gotaran de hatine parvekirin û ji rastnivîsa wan nivîskar bixwe berpirsin*
*û ne mecbûr in ku ew mîna yên weşanger û edîtor bin. Hemû gotar, nivîs, pêşgotin, reklam,*
*materyal û naverokên din bi niyeteke safî hatine amadekirin.*

# NAVEROK



**Nameya Edîtor**

Silav xwînerên ezîz yên The Hall Kurdiyê.
Kovara me gihîşt hejmara xwe ya 5an.
Bi kurdî bixwînin. The Hall Kurdî bixwînin.

Erol Başak ► 4




**Gaza Kurdistanê û Derfetên Nû**

Prof. Dr. Abdullah KIRAN ► 5



**HOGIR AR Û HÛNERA DÎJÎTAL**

Hevpeyvîn: Erol Başak ► 18



**SUNA ALAN Dengeke Kurdî Li Londonê**

Erol Başak ► 8



**STARLINK ÇI YE?**

DIGIKURD ► 24



**Çend Gotin Li Ser Şehnameya Firdewsî**

Necat Zivingî ► 12



**Festîvala Fîlmên Kurdî ya Stenbolê**

Mevlüt Oğuz ► 28




**MEDYA Girîngtirîn Amûr Di Xizmeta Pêşketinê Da!**

Seîde Perdîsiyan ► 15



**PARKA KEUKENHOFÊ**

Enîs Dursun ► 32

# NAMEYA EDÎTOR

EROL BAŞAK

*Silav xwînerên ezîz yên The Hall Kurdiyê.*

Kovara me gihîşt hejmara xwe ya 5an.

Di vê hejmarê de me stranbêjeke li Londonê kir mêvan. Berga kovara Gulanê Suna Alanê xemiland. Stranbêj Suna Alan bi eslê xwe ji Çewligê ye, Kurmanc û Elewî ye. Di nav malbateke qerebalix û hûnerhez de mezin bûye. Hêj di zaroktiya wê de hêstên kurdewar lê kemiliye. Suna bi her sê zaravayên Kurdî stran dibêje, stran dinivîse jî. Digel vê bi zimanên din wek Ermenkî, Yewnanî, Tirkî hwd. stran dibêje.

Piştî êrîşa Rûsyayê bi ser Ûkraynayê de li dinyayê qeyraneke enerjiyê rû da. Ewropa, Brîtanya û Amerîka niha li alternatîfên gaza Rûsyayê digerin. Di vê qonaqê de girîngiya gaza Kurdistanê bala cîhanê dikşîne. Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî di vê çarçoveyê de li welatên Ereb, Tirkiye û Îngilîstanê dîplomasiyek meşand. Profesor Abdullah Kiran ji bo The Hall Kurdiyê geşedanên di warê qeyrana enerjiyê de nivîsand: Gaza Kurdistanê û Derfetên Nû.

Nivîskar Necat Zivingî vê mehê li ser Şehnameya Fîrdewsî nivîsand. Şehname berhemeke çawa ye û girîngiya wê di edebiyata Farisî de çiye? Zivingî bersiva van pirsan û zêdetir jî di gotara xwe dide.

Me mîsyona The Hall Kurdiyê wek lihevgihandin û lihevcivandina Kurdan daniye ber xwe. Di hejmara 5an de em dibînin ku ji deverên cuda Kurd kovara me dixwînin û dixwazin bi nivîsên xwe tê de cî bigrin. Li gorî vê mîsyonê 2 xwînerên me ji me re nivîs şandin. Seîde Perdîsiyan ji Kurdistana Rojhilat wergereke xwe ya ji Farisî ya derbarê medyayê de şand. Enîs Dursun jî ji Hollandayê ji me re Parka Keukenhofê nivîsî û park da nasîn. Enîs Dursun cara yekem e ku bi Kurdî nivîsiye.

Em dixwazin xwînerên xwe teşwîqê nivîsandina bi Kurdî bikin. Hûn bi Kurdî binîvîsin, ji me re bişînin, em ê jî nivîsên we biweşînin.

Di hejmara Gulanê de me hevpeyvîneke din jî bi hunermendê ciwan û serkeftî Hogir Ar re kir. Hogir ciwanekî gelek jêhatî ye. Di destê wî de hunera dîjîtal dibe hunereke Kurdî. Lê hunera Hogir ne tenê ev e. Ew nivîskar e, helbestvan e, peykersaz e jî. Di vê hevpeyvînê de hûnê Hogir Ar ji nêz ve nas bikin.

Li Stenbolê meha borî Festîvala Fîlmên Kurdî derçû. Rojnameger Mevlûd Oguz ji serî heya dawiyê festîval şopand û ji bo The Hall Kurdiyê çavderiyên xwe nivîsand.

Projeya Elon Muskî ya bi navê Starlînk babeta teknolojiyê ye di vê hejmarê de. Starlînk projeyeke çawa ye û dê çawa înternetê bigihîne dinyayê? Di vê nivîsê de hûnê hemû hûrguliyên projeya Elon Muskî bibînin.

*Bi kurdî bixwînin. The Hall Kurdî bixwînin.*

# GAZA KURDISTANÊ Û DERFETÊN NÛ



PROF. DR. ABDULLAH KIRAN

29abdullah@gmail.com





Şerê Rûsya û Ûkraynayê, ya rast êrîşa Rûsya ya li ser axa Ûkraynayê di peywendiyên navnetewî de serdemeke nû vekir. Êrîşa Rûsyayê, di serî de dewletên Ewrûpayê, bi taybetî Ewrûpaya Rojhilat bi xetereke mezin re rûbirû kir. Hem Ewrûpa û hem jî Amerîka, bi şêwazeke ku heta niha qet nehatibû dîtin, li pêşberî dagirkeriya Rûsyayê sekinîn. Cîhana hemdem, bi lezûbez serî li ambargo û darzoriyan (sancktion, yaptirim) da û hê di hefteya pêşî ya êrîşê de, nîrxê pereyê Rûsyayê bi qasî ji %40î hat xwarê, gellek welatan riyên xwe yên ezmanî li pêş balafirên Rûsyayê girtin, çûn û hatina wan derbend kirin û herweha Rûsyayê jî qada xwe ya hewa jî li ber 36 dewletan girt.

Ji alî Rûsyayê ve dagirkirina welatê Ûkraynayê, di gellek warên cihê û cuda de serêşanên mezin peyde kir, ji xeleka şandina malan bigire, heta bidestxistina vejanê (enerjiyê), bandora xwe bi nebaşî li ser hemû tiştî nîşan da. Di demeke gellek kurt de buhayê hin tiştan, li hin welatan sê-çar qat zêde bûn. Hema bêje hemû welatên dinyayê, çi kêm û çi zêde di bin bandora vî şerî de man. Di serî de Polonya, bi taybetî welatên Ewrûpaya Rojhilat, di demeke gellek kurt de rastî pêla penaberan hatin û bi milyonan penaber û stargerên (siginmaci) Ûkraynayî li ser sînoran civiyan. Ji şerê Cîhanê yê Duwemîn vir ve, ev cara pêşî bû ku Ewrûpa rastî qeyraneke koçberî ya weha mezin dihat.

**Rûsya Gaza Xwe Wek Çekekî Siyasî Bikartîne**

Êrîşa Rûsyayê, hema bêje li ser seranserê cîhanê rê li ber krîzeke enerjiyê jî vekir. Çimkî welatên Ewrûpayê, bi giranî gaza xwe ya sirûştî û petrolê ji Rûsyayê dikirîn. Bi taybetî van salên dawî, her ku diçû Ewrûpa hê bêtir di pirsa enerjiyê de bi Rûsyayê ve dihat girêdan. *Rûsyayê bi projeya Herikîna Bakûr (North Stream) salê 55 mîlyar mt³ gaza sirûştê dişand Almanya, belê bi avakirina Herikîna Bakûr 2yê ve, ewê bikaribûya 55 mîlyar mt³ din jî bişanda Ewrûpa û bi vî awayî gaza ku dişand salewext derkete 110 mîlyar mt³î.* Projeya Herikîna Bakûr 2yê di sala 2018an de dest pê kiribû û xeta boriya ya ku dirêjahiya wê 1230 km bû, îsal piştî serê salê amade bûbû. Ev Proje bi 11 milyar dolarî temam bûbû û beriya şer, gaza sirûştî berî lûleyan dabûn jî. Îcar gava ku şer dest pê kir, hikûmeta Olaf Scholz ya Almanyayê, karê herikîna gazê da rawestan. Ji xwe Amerîka ji destpêkê ve li hember Projeya Herikîna Bakûr 2yê radiwest û herdem digot Rûsya dixwaze vê projeye wek çekekî siyasî li hember Ewrûpayê bikar bîne.

Tiştê ku Amerîka digot hate serê Ewrûpiyan. Çimkî dewletên Ewrûpa, bi taybetî, Almanyayê hevkariyek xurt bi Rûsyayê re danîbû û danûsandina wan a vejanê(enerjî), di dema serokwezîra kevin Angela Merkel de gihîştibû radeyeke girêbendî (bagimlilik, dependency). Çimkî Almanya, ji % 50-55ê gaz û petrola xwe ji Rûsyayê dikirî. Îcar Rûsyayê, bi şerê xwe yê li hember Ûkraynayê re, kartê enerjiyê danî ser masê û enerjiyê wek çek li hember dijberên xwe bi kar anî. *Vê helwest û tevgera Rûsyayê, di bazara enerjiyê de hevsengiyeke nû çêkir.* Bi bilindbûna buhayê enerjiyê re Amerîka û dewletên Ewrûpa ji welatên wek Suudî Erebîstanê xwestin ku berhêneriya (production) xwe ya enerjiyê zêde bikin, belê Suudî Erebîstanê ev yek qebûl nekir. Bi ser de, di heman demê de, li Yemenê, hêzên ku bi Îranê ve girêdayî ne, êrîş anîn ser refîneriyên Suudî û xwestin berhêneriya Erebîstana Suûdî hê kêmtir bikin. Bêguman hemleyên bi vî cûreyî karê Rûsyayê

siviktir û destê wê jî xurttir dikirin. Çimkî Rûsya û Îran bi hev re tev digeriyan û Îranê bi aşkerayî piştgiriya Rûsyayê dikir. Çawa ku tê zanîn, piyasaya gaza sirûştî bi giranî di destê Rûsya û Îranê de ye; rezervên Rûsyayê di dora 48 trîlyon metrekupî, yên Îranê jî di dora 34 trîlyon metrekupî de xuya dikin. Piştî Rûsya û Îranê, Katar (24 trîlyon mt³), Turkmenîstan (15 trîlyon mt³), Amerîka (13 trîlyon mt³), Erebîstana Suûdî (8 trîlyon mt³), Mîrekiyên Yekbûyî yên Ereban (7 trîlyon mt³) di rêza dewletên ku dewlemendên gazê ne de cih digirin.

**Hevsengiyên Nû û Kurd**

Piştî ku Rûsyayê êrîş anî ser Ûkraynayê, hingê dewletên Ewrûpî ji bo kirrîn û bidestxitina enerjiyê, li ser rê û çareyên nû fikirîn. *Di heman demê de, di roja 28ê Adara 2022an de Mesrûr Barzanî Li Dubaî, di civîna Konseya Atlantîkê ya Foruma Enerjiyê ya Gerdûnî de diyar kir ku Kurdistan di pirsa enerjiyê de, dikare hin hewcedariyên Ewrûpayê pêk bîne.* Piştî civîna Konseya Atlantîkê Mesrûr Barzanî di roja 15ê Nîsanê de li Tirkiyê bi Serokkomar Erdogan re cîviya. Çar roj piştî hevdîtina bi Serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyîp Erdogan re, vê carê Mesrûr Barzanî berê xwe da riya Îngilîztanê. Li Londrayê pêşwaziyek têr baş li Mesrûr Barzanî hat kirin û di asta herî bilinde de pê re civîn hatin çêkirin. *Mesrûr Barzanî*, li gel Serokwezîr *Boris Johnson*, herdu serokwezîrên kevin ên Îngilîztanê jî dît û bi wan re jî civiya. Pişt re *Mesrûr Barzanî* li *Chatham Housê*, ku wek Enstîtuya *Peywendiyên Navnetewî yên Padîşahiyê* tê naskirin, axaftineke balkêş kir û di axaftina xwe de, pêşniyaza Iraqek Konfederal anî ziman.

Bêşik rewşa nû, hin fersendên baş tîne ber lingên Kurdan jî. Hê em têr baş nizanin bê ka gelo miktara gaza sirûştî ya Kurdistanê çiqas e. Li gor hin agahdariyan, gaza Kurdistanê ne kêmî 5-6 tirilyon metrekupî de ye. *Eger em gaza Kurdistanê kêm zêde bi qasî 5 tirilyon mt³ jî bihesibinin, hingê Kurdistan li Rojhilata Navîn bi dewlemendiya xwe ya gazê di rêz pêncan de ye û di demeke nêzik dikare di warê gaz û petrolê de, di nav aboriyên gerdûnî (global) de cih bigire.* Herweha Kurdistan bi hêsanî dikare di pirsa gazê de ji bo Ewrûpayê bibe derî û çareyek nû. *Gaza Kurdistanê dikare dawî li girêbendiya gazî ya Ewrûpa bîne û êdî nema ku Rûsya bikaribe gaza xwe wek çek li hember Ewrûpiyan bikar bîne.* Belê karê Kurdan ne hêsan e. Çimkî li pêş derfiroşiya gaza Kurdistanê hin berbend û astengên girîng hene. Bi taybetî Îran û hêzên ku li ser navê wê tev digerin, naxwazin ku vê riyê li ber Kurdan vekin. Carisiya li kuçeyên Londrayê û li bajarên Ewrûpa dagirkirina nûnertiyên Kurdistanê, li ser hesabê Îran û Rûsyayê hatin kirin.

Bi kurtî, şerê Rûsya û Ûkraynayê, ji bo firotan û derfiroşiya gaz û petrola Kurdistanê hin derfetên nû bi xwe re anîn. Kifş e ku desthilatiya Kurd jî baş hay ji vê yekê heye. *Eger Ewrûpa û Amerîka bixwaze ku gaz û petrola Kurdistanê li bazarên navnetewî bê firotan, helbet ewê bikaribin riyekê peyder bikin. Di rewşa heyî de Tirkiye û Îngilîztan rolekî mifteyî dileyizin.* Eger dîplomasiya Kurd, piştgiriya Enqere û Londrayê standibe, hingê ewê hewldanên Îranê û hêzên wê yên paramîlîter zêde feyde nekin. *Di demeke nêzik de gaza Kurdistanê bigihîje Ewrûpa, fersend û îmkanên baştir li pêş Kurdan vebibin.*



# SUNA ALAN

## DENGEKE KURDÎ LI LONDONÊ

HEVPEYVÎN:
**EROL BAŞAK**



Stranbêj Suna Alan li Londonê dijî. Bi deng û awazê xwe yê zelal û narîn stran û kilamên Kurdî vedijîne, li kesên nekurd dide guhdarîkirin û bi wan zimanê Kurdî dide hezkirin. Meriv dikare bêje ku bi mîsyoneke bi rûmet li Brîtanyayê nûnertiya Kurdan û Elewiyan dike. Suna bi zimanên din jî stranan dibêje û herwiha pir û dostaniyê di navbera netewe û zimanên din de ava dike. Ne tenê li Brîtanyayê lê li Ewropayê jî konsertan dide. Ew gelek tê hezkirin û gelek tê guhdarîkirin.

Stranbêja Kurd a delal û serkeftî Suna Alan ji The Hall Kurdiyê re axivî. Kerem bikin bi pirs û bersivên li jêr vê hûnermenda hêja binasin.



**Tu li Londonê muzîka Kurdî dijînî, stranên Kurdî ji kesên nekurd re jî digihînî. Baş e, Suna Alan kî ye? Ji ku derê ye? Em dikarin te nas bikin?**

Ez li Çewlîgê li gundekî pir xweş di navbera çiyayan de hatime dinê. Navê gund Liçik e ku bi Ermenî tê maneya gola biçûk. Malbata min Kurdên Elewî ne. Di mala me de hem dengbêjên Serhedê dihatin guhdarîkirin û hem jî stran û gulbangên Kurdên Elewîtiyê. Dema ez du salî bûm malbata min koçî Îzmîrê kirin. Em di taxeke xizan de dijiyan. Cîranên me yên li wir piranî welatparêzên Kurd ên ji Mêrdînê yên ji şer koçber bûn û her wiha çep û sosyalîstên Elewî yên ji Mereşê yên ji Komkujiya Mereşê ya 1978an reviyan bûn.

**Te çawa dest bi stranbêjiyê kir? Tu bi xwe hay ji deng û hûnera xwe hebûyî an kesekî din got “Suna dengê te gelek xweş e, rabe stran bêje?” Ew xweşbûna dengê te ji ku tê? Di nav malbata te hebû?**

Ji ber malbat û derûdora xwe ez her tim di nava muzîkê de bûm. Di çanda me de tembûr pir cihekî girîng digire. Hemû xwişk û birayên min tembûr lêdixin û dengên wan jî pir xweş in. Di jiyana min de her tim muzîk hebû. Ez hîn zarok bûm her tim xwişk û birayên min, xaltiyên min, xalên min û endamên malbatê yên din dihatin ba hev û bi hev re tembûr lêdixistin, stran digotin û govend digirtin. Bi taybetî xalê min ê ku 28 sal in girtiyê siyasî ye û xaltiya min Ayten Tekîn a li Mêrdînê Bagokê jiyana xwe ji dest da ji min re bûne mînak. Min kilamên “Kî ne Em”, “Bîngol Șewtî” û “Geliyê Zîlan” cara yekem ji wan bihîst.

**Zaroktî û ciwaniya te li Îzmîrê derbas dibe. Îzmîr bajareke çawa ye ji bo te û tesîreke çawa li te û stranbêjiya te kiriye?**

Zaroktî û ciwantiya min li Îzmîrê ku çandên cûr bi cûr lê hebûn derbas bû. Herwiha muzîka herêma Îzmîrê (Symrna) jî bandora xwe li ser mûzika min nîşan da. Ez li vir di bin bandora kilamên Egeyê de mam. Piraniya Rûman li Îzmîrê asîmîle bûne. Ji ber ew jî wek me li wir biyanî bûn, em nêzikî hevdû bûn. Ew rengînî û cûdatiya wan bû sedem ku ez bi wan re bibim heval. Bi vî awayî jî ez muzîka wan hîn bûm û ez anoka li Zanîngeha SOAS a Londrayê vokaleka ya banda Rebetîko ye me.

**Kîjan stranbêjê/a Kurd herî zêde tesîr li te kiriye? An jî îdoleke/î te heye?**

Meryem Xan, Sûsika Simo, Nesrin Şerwan, Ayşe Şan û gelek hunermendên jin ên Kurd hene ku ez nikarim anoka navê wan bijmêrim ji bo min her tim îdol in. Bi taybetî ji ber ku jin bûn, di nava şert û mercên gelekî dijwar û feodalîzmê de hewl dan dengê xwe bidin bihîstin û ji bo hunera xwe bedelên mezin dan. Ez wan bi hurmet bi bîr tînim.





**Bi awayeke profesyonel te kengî dest bi stranbêjiyê kir? Beriya hatina Londonê te bi Kurdî distriya an te li vir destpê kir?**

Beriya ku ez li Londonê bi cih bibim, min di salên zanîngehê de bi amatorî stran digotin, lê piştî ku ez hatim Londonê, nêzîkî deh sal berê min bi profesyonelî dest bi stranbêjiyê kir. Ji ber ku hejmara jinên ku li Brîtanyayê stranên Kurdî dibêjin pir hindik bû, pêdiviya pêşvebirin û ragihandina stranên Kurdî bêtir min teşwîq kir ku ez bi awayekî profesyonel stranên Kurdî bistirêm.

**Suna, em dibînin tu bi geşedanên di civaka Kurdan de re gelek eleqedarî û kesekî hestyar î. Te ji bo Nadia Murad stran çêkiriye, ji bo Nûdem Durak stran çêkiriye. Dixwazim vê bipirsim. Suna Alan ji bo çi û kê distre? Te mîsyoneke çawa daye ber xwe?**

Ez ji zarokatiya xwe ve di nava bûyerên wek koçbûnê, girtina kes û nasên xwe ji aliyê polîs ve, zulm û zor, îşkence û mirinan de dijîm. Wisa xuya ye ku ew di mêjiyê me de pir cîh girtine, bûnê parçeyek me. Li ku derê em neheqiyê bibînin, em nikarin bêdeng û xemsar bimînin. Muzîk ji bo min rêyek e ku ez dengê gelê xwe bidim bihîstin. Ji bo min mûzîk şêwazeke vegotinê ya pir xweş e ku ew rêyek e ku ez ne tenê êşên gelê xwe, lê herwiha dewlemendiya çanda Kurdî jî bidim nasîn.

**Tu hema hema her stran an jî kilamê bi tarzên cuda cuda dikarî bêjî. Ev, bi min deng û hûnereke pir hêja û bi qîmet e. Ji bo vê te perwerdehî hildaye?**

Ez bi heft xwîşk û birayên xwe re di nav zehmetiyên aborî de li taxeke derbajarî mezin bûm. Min li zanîngehê di bin şert û mercên pir dijwar de mamostetiya zimanê Îngilîzî xwend. Mixabin tevî van hemû bêmimkûniyan jî ne mimkûn bû ku ez perwerdeya muzîkê bistînim. Piştî ku ez hatim Londonê, min karî ji bo demeke kurt dersên stranbêjiyê bistînim. Ji ber ku muzîk kevneşopiyeke malbatê ye, bi dîtina min ji zarokatiya xwe ve mijûlbûna bi muzîkê ji bo min avantajeke mezin bû.

**Tu ne tenê bi Kurdî lê bi zimanên cuda jî stran dibêjî. Li şehrekî navdewletî û pirçandî de dijî. Di warê muzîkê de tu cihê zimanê Kurdî ku zimanekî bêdewlet e, li ku dibînî?**

London bajarek e ku gelek nasnameyên etnîkî û olî bi hev re dijîn. Ez carinan li ser dikê stranên Yewnanî, Erebî, Ermenî, Tirkî û Sefardî jî dibêjim, lê bi giştî, helbet ez stranên Kurdî dibêjim. Em hêj nikarin bi qasî Ereb û Afrîkîyan dengê xwe bigihînin qada cîhanê. Lê ji ber Kurdên dîasporayê hema bêje li gelek deverên cîhanê stranên bi Kurdî tên guhdarkirin. Stranbêjên me yên Kurd ên li cîhanê navdar hene, lê hejmara wan pir kêm in.



**Ez vê jî meraq dikim. Kesên ji miletên din ku tên guhdariya te dikin, çawa ji konsertê vedigerin? Ji bo muzîka Kurdî çi dibêjin?**

Bi giştî ez bi Îngilîzî her çend bi kurtî be jî çîroka stranên ku ez dibêjim guhdarvanan re parve dikim. Dema ku guhdarvan ji stranê fam dike, bêtir hîs dike û fersendê dibîne ku çanda Kurdî, hindik be jî, nas bike. Piştî gelek konseran, min gelek kes nas kirin ku dixwestin bêtir li stranên vî gelê bêdewlet guhdarî bikin û dixwestin di têkiliyê de bimînin. Gelek xwendekarên etnomûzîkolojî an jî etnomûzîkolog bi min re têkilî danîn. Di van demên dawî de, hunermendek ûdê ya Xiristiyanî ya Filistînî bi min re têkilî danî. Dixwest bi min re stranek ji hunermendê me yê Rojava Mihemed Şêxo qeyd bike. Bi dîtina min danasîna muzîka Kurdî ji gelên din re gavek e ku dê Kurdî bi muzîka cîhanê bide nasîn.

**Em hinek jî behsa xebat û konsertên te bikin. Di rojên bê de (ji Gulanê pêve) konsertên nû hene? Kengî û li ku ne?**


Di 30ê Nîsanê de,ez ê ji bo helbestvanê Kurd Cengîz Sînan Çelîk ê 25 sal in di girtîgehê de ye, di resepsiyona ku li Parlamentoya Danîmarkayê de tê lidarxistin de stranan bibêjim. Em ê di 7ê Gulanê de bi Koma Rebetiko ya Zanîngeha SOAS a Londonê re li The Mildmay Club li Londonê konserekê bidin. Ev bi giranî bi stran û dîlanên Yewnanî û Kurdî dê konserek xweş be. Di meha Hezîranê de ez ê di Festîvala Elewiyan a Brîtanyayê de, herwiha di Festîvala Muzîkê ya Brighton û Festîvala Jinên Kurd a Brîtanyayê de derkevim ser dikê. Her weha, ez ê di meha Hezîranê de li Kopenhagê beşdarî konserekê piştgirîyê bibim.

**Suna xan ez gelek spas dikim ji bo van bersivên jidil. Gotina te ya dawî heye?**

Bi taybetî jî em hunermendên Kurd ên li Ewropayê ku xwedî derfetên ewqasî baş in, li ku derê lê bin, divê çand û hunera Kurdî bi her cure hunerê vebêjin û bidin nasîn. Heta divê em vê weke berpirsyariya xwe bibînin. Dîroka me vê berpirsyariyê li ser me ferz dike.

**Deng û dilê te sax bin. Her serkeftî bî.**

Spasdar im. Silav û rêz



# ÇEND GOTIN LI SER ŞEHNAMEYA FIRDEWSÎ

NECAT ZIVINGÎ
necatzanyar@gmail.com





Çend sal berê dema li bajarê Tûsê çûm aramgeha Firdewsî, min Şehname bi tevahî nexwendibû. Lê helbet nav û dengê Firdewsî û beşên Şehnameyê ku min xwendibûn, bandoreke mezin li ser min kiribû. Jixwe taybet, ji bo Firdewsî bi rêya Tûsê ketibûm.


Firdewsî (935–1020) helbestvanê Îranî yê serdema Samanî û Xezneyîyan e. Di dema wî de berhemên kevn bi zimanê Pehlewî bûn. Ew jî fêrî wî zimanî bû û Şehnameya xwe ya navdar nivîsî.

Berya Firdewsî, gelek kes bi pey nivîsîna dastanên Îranê ketibûn. Hikumdarê Sasanîyan Nûşîrewan jî ev dastan dabûn nivîsîn. Pirtûka bi navê Xudeyname ku ji alîyê Danişwer ve hatibû nivîsîn, piştî têkçûna Şerê Qedîsîyeyê ketibû destê Ereban û ji Xelîfe Omer re hatibû şandin. Rûzbîh Ibn Muqeffa vê berhemê di sedsala 8an de werdigerîne Erebî; lêbelê piştre winda dibe.

Piştî desthilata Ebasîyên Ereb qels dibe, di dema dewleta Saffarîyan de berhema Danişwer ji Pehlewî bi bal Farisî ve tê wergerandin û bi navê Şehname di sala 879an de tê çapkirin. Piştî çil salê Saffarîyan, dewleta Samanîyan jî vê kevneşopîyê didomîne. Di dema Xezneyîyan de Firdewsî bi pey destxetên berê dikeve û di çil salîya xwe de dest bi nivîsîna Şehnameyê dike. Nêzîkî heştê salîya xwe berhemê diqedîne û pêşkêşî Siltan Mehmûdê Xezneyî dike. Lêbelê wezîr û şêwirmendên siltan dexesîyê dikin û Firdewsî neçar ji Xezneyê direve. Dema dimire jî bi Rafizîtîyê tê tohmetbarkirin.

Şehname, ji 60 hezar malikê pêk tê. Ji şahê yekem Keyûmars heta serdema Yezdîgîrdê Sêyem, dîroka Îranê vedibêje. Vehûnaneke ezamet û nuwaze ye. Dastan; bi navê xwedawendê ku aqil û can afirandine dest pê dike. Li gor Firdewsî; hizra mirovan rêyekê nabîne ku xwedê têbigihîje. Jixwe pêwîstîya xwedê bi nav û navnîşanê tune ye. Hiş tenê dikare ji ya dibîne re peyvan çêke. Lewra Firdewsî mijara pesindana xwedê dirêj nake û berê xwe dide hiş û aqil. Beşa yekem; pesindana hiş e. Bi dûvdirêjî pesnê aqil dide. Tişta herî qenc ya ku xwedê daye hiş e. Pesindana hiş, rêya herî qenc e. Hiş; canewereke nemir û kakilê jîyanê ye. Hiş; çavê ruh û giyanî ye… Mirov di kêm berheman de bi qasî Şehnameyê pesindana aqil û hiş dibîne.

Piştre beşên wek afirandina 'alemê, afirandina mirovî, afirandina rojê, afirandina heyvê tên. Piştî pesindana pêxember, beşa behsa nivîsîna Şehnameyê, pesindana Ebû Mensûr û Siltan Mehmûd heye. Û dastan bi çîroka Keyûmars dest pê dike. Keyûmars li ser cîhanê mirovê yekem e ku tac daye serê xwe. Bi awireke îran-sentrîk (ne fars) dastanên Pîşdadî û Keyanîyan têne vegotin. Dehaq wek Ereb tê nasandin û di wê beşê de navê Kurdan derbas dibe.  Ji ber ku navê Farisan derbas nabe, mirov dikare bibêje ew gelê ku Firdewsî di navendê de dastanên wan vedibêje Kurd in. Lêbelê vê yekê bi zelalî nabêje. Ew, nasnameya Îranîbûnê derdixe pêş.



Mezinkirina Zal ya ji alîyê teyrê Sîmurx ve vegotineke fantastîk e. Çîyayên Elburz, Demawend û alaya Kawa ku ji rengên sor û zer û mor pêk tê, motîfên balkêş in. Cîhan li Îran (Îrec) û Tûran (Tûr) û Rûmê (Selm) tê dabeşkirin û karakterîstîka her yekê tê vegotin. Tûran êrîşkar e, Rûm parastvan e, Îran jî senteza herduyan e. Rustem û bavê wî Zal di navenda vegotinê de ne. Tenê Efrasîyabê Turanî dikare bireve û canê xwe xilas bike, ji Rûstemê ku ti dêw û qareman ji derbê wî xilas nabin.

Firdewsî jîyana bi debdebe û xweşbext ya şeh û padşehan weke xewnekê li ber çavan radixe. Bi gotinên herî xweş wesf û pesnê wan dide. Behsa qencî, neqencî û qaremanîya wan dike. Tim gotinê tîne ser bêwefabûna dinyayê û pesnê fezîlet û qencîyê dide. Ji vî alîyî ve; pir ji dastanên Homeros yên bi navê Îlyada û Odysseia bilindtir û balkêştir e. Her cara gotin tê ser bêwefabûna dinyayê mirov difikire; ew şeh û padşehên ku ev dastan bihîstine gelo çawa dîsa jî di ser xwe re çûne û xirabîyên mezin kirine? Qey pê nehesîyane ku cîhan ji kesî re nemaye û namîne!

Firdewsî bi Şehnameyê, bîra neteweyeke pir xurt ava kiriye. Hemî nifşên Îranî bi vê berhemê dikarin bîra xwe (em û ew) binasin. Ji Îranîyan re gerdûneke bê dawî ye. Ji bo me Kurdan ibret e. Jixwe ya ku Şehname ji nû ve bi min da xwendin, xebata min ya li ser hişê Kurdî bû.

Şehnameyê bandoreke mezin li ser huner û edebîyatê jî kiriye. Bi bandora Şehnameyê gelek berhemên wek Samname, Gurşasbname, Ferâmurzname, Cîhangîrname, Behmenname û Berzûname hatine nivîsîn. Her wiha gelek caran li gelek zimanan hatîye wergerandin. Di dema dewleta Eyûbîyan de, Şerefedîn Îsayê nevîyê Selahedîn Eyûbî jî wergera Şehnameyê kiriye.

Çawa bandora xwe li hemî gelên Aryanî û mîtolojîya cîhanê kiriye, her wiha di bîra Kurdî de jî taybetmendîyeke Şehnameyê heye. Xuya ye ev taybetmendî heya niha baş nehatiye vekolan û nîqaşkirin.

Firdewsî ji bo Şehnameyê wiha gotîye:

*Besî renc burdem der în sali sî*
*Ecem zinde kerdem bedîn Parsî*

Min di vî sih salî de gelek cefa kişand, Ecem bi vê Farisîyê zindî kir. Ehmedê Xanî 600 sal piştî Firdewsî bi sirûşa Şehnameyê, Mem û Zîn bi Kurdî nivîsî û wiha silav li Firdewsî kir:

*Safî şemirand vexwari durdî*
*Manendê Derî lisanê Kurdî*

*Înaye nîzam û intizamê*
*Kêşaye cefa ji boyî ‘amê*

*Da xelq nebêjitin ku Ekrad*
*Bême‘rifet in, bêesl û bunyad*

Tûs û aramgeha Firdewsî ji bo min yek ji welatên xewnistanê bû. Pêjna mîtolojîyên hezar salan ji peyker û nîgar û resman dihat. Ohrmazd baskên xwe bi ser Aryanê de vegirtibûn. Bîra kûr digot ez li vir im, neçûme ti derê. Li xwe hay bin. Hûn li kur in!

*[Nîşe: S. Feysel Muctevî, Şehname bi wezn wergerandîye Kurdîya Kurmancî. Xweş xeber e ku wê îsal Kurdîya Şehnameyê ji alîyê Weşanxaneya Peywendê ve were çapkirin.]*



# MEDYA GIRÎNGTIRÎN AMÛR DI XIZMETA PÊŞKETINÊ DA!



**HEKÎM BESÎRET**
Karnasê Bilind ê rojnamevaniyê

Wergêra ji Farisî
**SEÎDE PERDÎSIYAN**





Ji destpêka şaristaniyetê ve ji bo pêwendiyê pêdiviya mirovan bi hin alavan hebûne û bi sedema bidestxistina teknolojî û şêwazên nû, roj bi roj ew ber bi pêşveçûneke berfireh ve diçin û heya wê astê ku mirov digihêje dewreke dîrokî xwe ya tijî evrazî û nişîviyê ku bi zêdebûna nifûsê, zêdetir hewcedarê alavên nû yên têkilî û ragihandinê dibe.

Her amûrek rê û rêbazên ku ji bo pêwendî û ragihandinê tên bikaranîn, medya ye. Lêbelê ya ku îro weke medya di nîqaşên rojane yên me da bi kar tê, behsa medyayên komkî û giştî dike, ji wan radyo, televîzyon, sînema, rojname, kovar, înternet, torên civakî û hwd.

Laswell teorîsiyenekî Amerîkî di warê peywendî û ragihandinê de, sê rolên cuda medyayê re diyar kirine:

1. Rola çavdêriya ser derdorê, yan rola nûçeyî.

2. Rola hevgirtina civakî yan rêvebirî û rênimayî.

3. Rola perwerdehî yan veguhestina mîrata çandî.

Di serî de rola nûçeyî yan çavdêriya ser derdorê yek ji rolên girîng ên medyayê ye ku bi weşana nûçeyan, mirov civaka xwe nas dike û bertekên pêwîst nîşan dide. Ya duyem rola analîzan şirovekirina bûyeran e ku girîngiyeke taybet heye û dikare ji bo pêwendiya di navbera şarezayên civakê, gel û berpirsan de xizmetên balkêş pêşkêş bike û wek neynika tevahiya raya giştî di warê hevkarîkirina gel û beşdarkirina wan di xebatên civakî da roleke girîng û berbiçav bilîze. Rola sêyem, rola perwerdekirinê ya medyayan e ku bi weşana nûçeyên curbicur yên zanîstî û çandî bazineya nêrîna gel berfireh dike û her wiha dikare alîkariyê bide guhastina mîrata çandî ya civakê ji nifşekê bi nifşa din û misogerkirin û berbelavkirina nasnameya çandî.

Taybetmendiya sereke ya medyayan ev e ku; li her derê hazir in û li gorî pisporekî vî warî; medya dikarin poleke bê dîwar a bi pişikdariya bi milyaran guhdar û temaşevan pêk bînin. Bi vê pênaseyê girîngî û bandora alavên peywendiyên komkî di pêkhatina gelek têkiliyên civakî, aborî û siyasî da zelal dibe.

Bi vê wesfkirinê, mebesta me ji pêşketinê çi ye û medya çawan dikarin di pêşketin an pêşneketina civakekê da dikarin bibandor bin?

Pêşketin pêngavrakirina ji bo derbasbûna ji rewşa heyî na rewşa baş û guherîneke erênî di pîvanên pêşketina mirovî da ye. Em bi giştî dikarin amajeyî babetên wek pêşketin û berfirebûna çavkaniyên aborî, sermayeyên fikrî, binesaziyên perwerdehiyê, perwerdeya mijarên têkildarî jîngehê û her wiha gelek heger û faktorên din bikin.

Li gor Maykil Tûdaro ku yek ji zanyarên warê zanîstên civakî ye û dibêje; “Divê ku pêşketin tevgereke çendalî bê zanîn ku hewcedarê guherînên bingehîn di nijyara civakî, şêwaza zanîn û têgihiştina gel û dezgehên neteweyî û herwiha lezandina pêşveçûna aborî, kêmkirina newekhevîtiyê û kokbirrkirina hejariyê ye.”

Medya ango alavên ragihandina komkî ne tenê amûr û hegera pêşketinê tên hesibandin, belkî bi xwe armanc û pîvana pêşketinê jî tên hesêb. Vêga welatên ku ber bi pêşketinê ve diçin gihîştine vê encamê

ku pêşveçûn wekî pêvajoyeke guherîna rewşa heyî û ber bi rewşeke baş ve çûne û vê yekê pêdivî bi guhertinên bingehîn di serederî û nêrînên mirovan da heye û yek ji heger û faktorên girîng di vê guherîna têkiliyan de ye ku di vê navberê da mêdyayên komkî girîngtirîn emrazê wê tên hesêb.

Berevajiya vê yekê jî rast e û medya li gor tênegihîştina rastiyên civakî, nebûna xwendin û nivîsîna akademîk, nebûna tecrûbeyên pêwîst, girêdayîbûna bi kesan, partiyan û hin tevgerên siyasî va û hebûna berjewendiyên kesane dibin sedema pêşneketina civakê.

Di vî warî de bajarê Ûrmiyê mînakeke bi cî ye ku medyayên wî ewqasî mijûlê meseleyên etnîkî û gêreyên nasnameyî û qewmî ne ku gelek pirsgirêkên aborî, binesazî û pêşvebirina çandê û hevdengiya giştî jibîr kirine; di astekê da ku gelek kes û aliyên siyasî ji vê rewşa nezelal sûdê werdigirin û di demên weke hilbijartinê da mijar û gêreyên etnîkî ji bo bidestxistina deng, hêz û dirêv bi kar tînin.

Medya xwediyê wê potansiyel û şiyanê ne; ji bilî ku di warê birêvebirin û kontrolkirina raya giştî da alavek ji bo ragihandin û haydarkirinê ne, dikarin di hilêxistina senariyoyên cihê da û meşandina siyasetên hilêxistî ber bi armancekê va di demên curbicur da gelekî bibandor bin. Vêca pabendiya exlaqî, pisporiya pêwîst, pêwendiya berfireh tev gel û berpirsan, dahênerî di amadekirina raporan û ragihandina dirust a bûyeran jî pêşmercê vê yekê ne.

Medya bi saya pêwendiya digel saziyên kargêr û rêvebir, balkişandina ser pêwîstî û girîngiya pêşketinê, pêgiriya ser azadiyên kesane û komkî, wekheviya zayendî, girîngiya kêmkirina newekhevîtiyê ji bo dadgeriya aborî di navbera beşên civakê da, eşkerekirina gendeliyê di saziyên hikûmetê de, agahdarbûna di warê mafên medenî da, rexnenirxandina karûbarên sazî û rêxistinên dewlet û zêdekirina agahiyên kesane di warên perwerdehiyê da dikarin xizmeta pêşketinê bikin.

“Haydarbûna civak” girîngtirîn pîvan e ku mirov dikare ji bo rola medyayan û têkiliyên pêşxistinê berçav bigire, bi vê wateyê ku mirovan di civaka îroyî da ji bo bidestxistina kelûpelên herî-bawerpêkirî û dilniya yên jiyanê, pêdivî bi agahiyên pêwîst hene ku ev yek ji bilî bikaranîna dirust a nûçeyan û şiroveyên medyayên komkî nepêkan e.

Bi her awayî, divê ku ewlewiyeta sereke ji bo medya û medyakaran bêalî û serxwebûn be ku ev yeka dikare bibe sedema pêbaweriya giştî û bêguman bandora wê yê di demeke dirêj di xizmetên pêşxistinê da diyar be.





# HOGIR AR Û HÛNERA DÎJÎTAL

**HEVPEYVÎN**
**EROL BAŞAK**

Hûnera dîjîtal pîşeya popûler ya van salên dawîn e. Di navbera ciwanên Kurd de jî ev hûner gelekî belav dibe. Ji Kurdan jî gelek hûnermedên serkeftî hene ku li ser torên medyaya civakî bala cîhanê dikşînin û bi deh hezaran şopînerên wan hene. Yek ji wan jî Hogir Ar e. Ew hem hûnermedê hûnera dîjîtal e, hem jî nivîskar, helbestvan, peykervan û lêkolîner. Hogir Ar zanîngeh nexwendiye û ji bo van hûnerên xwe perwerdehiyeke taybet jî hilnedaye. Bes bi zîrekbûn, jêhatîbûn û keda xwe berhemên nûwaze diafirîne. Helbet di jiyana wî de jî zehmetî hene. Di pirs û bersivên di jêr de hûnê serpêhatî û fikrên Hogir hîn bibin û vî hûnermedê ciwan ji nêz ve nas bikin.



**Hogir, tu hunermendekî ciwan î. Pêşî em dikarin hinekî te nas bikin. Hogir kî ye, ji ku derê ye?**

Ez di sala 1996an de li bajêrê Batmana bakurê Kurdistanê ji dayîk bûm. Û zaroktiya min li kuçeyên taxê derbas bû. Bi eslê xwe ji eşîra Reşkotan im. Dibistana destpêkê û dibistana navîn min li dibistana taxê xwend, bavê min mamosteyê min bû. Perwerdeya dibistanê têra min nedikir. Zimanê Tirkî di pola şeşan de hîn bûm. Çand û folklora Kurdî, şairên Kurdî, nivîskarên Kurdî, xebatên Kurdî min wê demê nas kirin.

Em şeş bira û xwişkek in. Bavê min dixwest ku em bo çand û hunera Kurdî kedê bidin. Lê herî zêde di nav birayên min de bala min dikşand û bi wî zaroktiya xwe min bi bavê xwe re nîqaş dikir li ser mijaran. Hûner bala min dikêşand û min xêzên xwe yên zaroktiyê di dibistana navîn de pêş xistin. Di pola heftan de ez di pêşbirkeke ku li seranserê Tirkîyê hat darxistin de bûm yekemîn.

Ez di pola heştan de bûm bavê min hat girtin. Divêyabû ez li rêç û perwerdeya wî berdewam bim. Min wisa jî kir. Ji ber ku bavê min hatibû girtin karûbarên malê û debara ket ser milê min û birayê min î mezin. Min dendikên zebeşan difirot, di karê sanayî, inşaat û her wiha gelek sektorên din de xebitîm. Lê min nedixwest bixwînim, ez çardeh salî bûm, min pirtûkeke Tirkî Şîn Mişext nivîsî.

Min perwerdeya zimanê zikmakî ya akademîk li sazîya Kurdî hilda. Huner gelekî bala min dikişand, herî zêde hunera Ewrûpayê. Perwerdeya min a kompiterê gelek baş bû. Min li ser peykerên bê teşe û gelek cureyên hunerê xêz dikir. Herwisa min bi teknîk û stîla xwe dest bi afirandina berheman kir.

Min dev ji xebatên bi zimanê Tirkî berda. Ji ber vê gelek caran mamosteyên dibistanê nîjadperestiyê li min kirin. Di vê pêvajoyê de ez zêdetir li ser platformên dîjîtal xebitîm û min tarz û stîla xwe ya folklorîk afirand.



**Hunera te, qesta min hunera dijîtal, gelek balê dikşîne. Tu bi berhemên xwe rojevê baş şîrove dikî. Baş e, tu çawa dixebitî?**

Şîrovekirina mijareke ji fehmkirina mijarê re derbas dibe. Divê ewilî mijar baş bê fêhmkirin û piştre bête avakirin. Afirandina berhemekê ji gelek qadan derbas dibe. Pêşî tu taslak amade dikî û li ser taslakê dixebitî. Piştre bi kîjan awayî bixwazi derxî holê (bi dehan programên vî karî hene) di programa yekem de wê taslakê dikî bibût an jî 3D. Mîna çêkirina xwarinê, divê ne şor be, ne tehl û ne jî şêrîn, di tehma xwe de çêbibe. Û dema bi van prensîban berhem bê çêkirin, tu şîroveya xwe dikarî derxî plana pêş û ew ê gelekî balê jî bikşîne.

Min ti perwerdeya vî karî nestand, tenê navbera min û karûbarên kompiterê gelekî baş bû. Ev jî bi rêya lêkolînên min yên li ser beşa nivîsar û grafîkê pêk hat.

Min di dibistana amadeyî dest bi hunera dîjîtal a Kurdî kir. Ji 14 saliya xwe heya niha di sê stîlan de min xebat afirandin:

*Stîla hunera dîjîtal a Kurdî folklorîk (nexş û nimûş)*

*Hunera dîjîtal a Kurdî û surrealîzm.*

*Û stîla dawî hunera dîjîtal a Kurdî bi zimanê global ê ku min pêşkêşî cîhanê kir.*

Lê di sala 2022an de jî min qadek ji NFT û Metaverseyê re vekir. Niha ji bo vê beşê berhemna diafirînim.

Heta niha bi hezaran berhemên û bi sedan koleksîyonên min û serî (series) ên min hene.

**Di navenda xebatên te de her Kurd û zimanê Kurdî heye. Armanc û hedefa te bi kurtasî çi ye?**

Di demên dawî de êrîşên li ser zimanê Kurdî zêdetir bûn. Ji damezrandina Tirkiyê heta roja îro tê xwestin ku zimanê Kurdî bê tinekirin û qedexekirin. Di roja me ya îro de jî siyaseta dewletê hewl dide zimanê Kurdî tune bike û asîmîle bike. Lê her ku dem derbas dibe Kurd hem siyasetê dikin hem jî ji bo parastina nirxên xwe yên netewî têdikoşin. Di vê hêlê de tiştê dikeve ser milê rewşenbîr û hunermendên Kurdan jî ev e ku bi zimanê xwe biafirînin. Armanca min ew e ku ez bidim nîşandan ku Kurd di aliyê hunera teknolojîyê de cih standine û wê xebatên gelek baş li dar bixin. Dixwazim Kurdên me yên ku ji çand û zimanê xwe dûr ketine vegere ser prensîbên xwe, ciwanên me berê xwe bidin vî zimanî û ez bibim



mînak.  Dixwazim karê ez dikim bala civaka sosyo-kulturî bikşîne û bi vê pêngavê gelek ciwanên Kurd dest bi Kurdî kirin.




**Baş e, berhemek çawa derdikeve holê? Tu çawa xeyal dikî?**

Digel ku em tam nizanin mirov çiqasî li ser vê axê mane jî, mirov dikare qala dîrokek 150-200 hezar salî bike. Dema ku em lê dinêrin ka yekem cûdahiya ji destpêka mirovahiyê niha derketiye çi ye, em dibînin ku ne karên teknolojîk, ne sêwiranên fonksiyonel û ne jî tiştên din in. Nîşanên pêşîn ên ku ji me re mane, her dem li ser “hunerê” ne.  Hê jî ne diyar e ka armanca wêneyên ku bi hezaran salan beriya niha di şikeftan de hatine xêzkirin çi ye. Armanca yekem ji nifşa nû re peyamek e an jî tenê bin hişî û xeyal e? Dema xeyal be tenê min û kesê wê demê afirînerê xêzên şikeftan têr dike. Lê dema peyam be civakê têr dike û somut e.

Wêneyên li dîwarên şikeftan ku em texmîn dikin hema hema çil hezar sal berê hatine xêzkirin, bi zelalî nîşanî me didin ku mirovê ku hîna hebûna wî li cîhanê di astek nediyar de ye, çawa kapasîteya “hilberîna”  kûr ku jê re hatiye dayîn fêhm dike. Bi rengekî bêbersiv û demdirêj. Ji ber vê yekê, çi ye sebeb ku huner ewqasî ji mirovan venaqete û çi dike ku huner ewqas xewn û xeyalan dîl dike?



Koordînasyon, an jî hevparî, bi rastî di têgihiştina hişê hunerî de têgehek pir girîng e. Di mejî de “navenda hunerî” ya taybet, an jî “navînek hunerî” ya taybet ku mirov bi jêhatîbûna hunerî ya cewherî bide nasîn tune. Afirandina berhemên hunerî kifş dike ku gelek beşên cihêreng ên mêjî dihêlin ku bi hevrêziyê bixebitin û ji vê orkestrasyona tevlihev çend awazên watedar, ango cûrbecûr berhemên hunerî derxînin holê. Bi gelemperî xeyalkirin ji afirandina teknîkî zehmettir e. Rola min ji ev e tiştên ku bi hêsanî nayên dîtin û nayê hîskirin derdixim holê.

**Kurd çiqas di nava vê hunerê de cî digrin?**

Birastî ev 12 sal in di nav van xebatan de me. Lê Kurdan îsal 2 sal in ev huner nas kir, ji ber ku min dereng parve kirin û berhemên xwe pêşkêş kirin. Aniha ez dikarim bibêjim piştî ku min danasîna hunera dîjîtal kir, herî kêm sî-çil kes, dest bi beşa hunera dîjîtal kirin. Nexasim beşa illûstrasyonê bala wan dikşîne. Ev huner ji bo Kurdan hat afirandin, ji serî heya binî divê Kurd tê de cih bigirin.



**Digital art çima girîng e ji bo Kurdan? Ev huner li Kurdistanê roleke çawa dilîze? Bi te ev huner dikare Kurdan ji bo armancekê bigihîne hev û xizmeta yekitiya wan bike?**

Huner hinekî mirovan nêzî hev dike. Bi nêrînek ji nêz ve li pirsgirêkên civakî, mirovên din û hestên wan, hawîrdora wan û tiştên rojane û şêwazên jiyanê yên li derdorê ez ji wan re dibim alîkar ku bibînin ka çi heye. Lê bi hêsanî nayê dîtin.

Ji bo vê em dikarin bibêjin ku gotin û vegotina hest û ramanên mirovan bi amûr û rastiyên cihêreng, bedewbûnî bi hunerê têne afirandin. Huner re ya ku jiyanê bi rûmet bike û wê watedar bike. Huner dikare di her qada jiyanê de hêz û kêfê bide mirovan.

Ji bo ku em bikaribin li ber cûrbecûr guhêrbar û bileziya guhertinê, daxwaz û bendewariyên bêdawî yên di temenê xwe de bihêlin, û li dijî rastiyên ku em negatîf dibînin têkoşînek pêwist bidin, pêdivî ye ku em fahmkirin û fikirkirina cîhana nû fêr bibin. Ev bo gelê Kurd pêngavên hunerî ne. Huner berhemeke civakî ye. Ji bo pêkhatina hunerê civak teqez pêwîst e. Bi gotineke din rastiya mirov çêkerê hunerê ye. Huner bê mirov nabe. Huner wekî qadeke hilberînê ya dinyayî û însanî rasterast bi mirov, civak û çandê ve girêdayî ye. Huner ji bilî ravekirin û têgihiştinên derûnî, felsefî, estetîk rê dide ravekirinên civakî, ango sosyolojîka civakê.







Hunermend li hemberî civaka xwe berpirsiyar e, bi pirsgirêkên civakê re têkildar e, lewma bi hesta erka civakî tê barkirin. Huner berpirsiyariyek e û ji bo pêşkeftina civakî peywiran digire ser xwe. Erka hunerê bihîstina dengê civakê di çav û wijdanê hunermend de ye. Huner jî mîna hemû kirinên mirovî, nikare bi tevahî ji berpirsiyariya civakî were dûrxistin, nikare xwe ji rêveçûna civakê û rewşa pêkhateya civakî dûr bixe.

Civak bo me/min çi difikire? Birastî pirseke gelekî baş e.

Ji civakên kevnar heta niha, di navbera huner û olê de peywendiyên berdewam hatine danîn.

Tenê ne olî têkiliya huner û siyaseta civakê, têkiliya huner û ekonomî, têkiliya huner û malbatê û hwd. Çima ev têkilî hertim têne danîn? Dema huner azad be wê civakê pêş bixe lê mixabin em hê jî tênegihîştine vê hişmendiyê.

Civaka Kurd ji ber ku civakeke misantropîst bû û di hunermend de fikrên olî, nêrîna siyasî û hesta civakî digeriya û dixwaze hunermend li gor fikr û ramanên xwe bixemilîne. Lê ev hunera dîjîtal wê hişmendîyê şikand.






Û da nîşandan ku hunereke azad heye. Ev du sal in ez medyaya civakî bikar tînim. Ev huner gelekî hat ecibandin. Birastî jî gelê Kurd hemû ked û projeyên min hembêz kir û xwedî lê derket. Aniha em gihîştine bi hezaran şopînerên Kurd. Hunerek bifikirin ku gihîştibe heta başûrê Afrîkayê û bi dehan rojname, kovar û televîzyonan re bûme mêvan. Ev huner min bi Kurdên başûr, rojava û rojhilat re girê dide. Demên pêş te em ê xebatên kolektîf çêbikin.

**Gelek kes te bi digital artê nas kir. Lê xebatên te yên cuda jî hene. Wek mînak tu bi edebiyata Kurdî re jî eleqedar î. Pirtûkên te hene, ma ne? Dikarî behs bikî ji me re?**

Belê, sala 2014an de min pirtûkeke bi navê Şîn Mişext derxist. Pirtûk bi Tirkî bû. Di 2017an de min çap kir û mijar helbest bûn. Lê belê poşmanîya min ê herî mezin jî ev bû ku min bi zimanê xwe çap nekir û min ji bo refên edebîyata Kurdî pirtûkek zêde nekir. Ev pirtûk dema çap bû heftiyekê de xelas bû û min neda çapa duyem. Aniha pirtûkek min a helbestê ku min qedandî heye bi navê Prehistoriya / helbest û yekem pirtûka hûnerê di Kurdî de ye. Di pirtûkê de ez qala Sûrrealîzm, Ekspresyonîzm Dadaizm, Fûtûrîzm, Konstrûktîvîzm, Kûbîzm, Pop Art, Mînîmalîzm û hwd. dikim û hunera dîjîtal didim nasîn. Ji bilî vê xêzeromaneke ku sê sal in li ser dixebitim heye û ew ê di wêjeya Kurdî de bibe mînaka yekem a xêzeromanê. Di nava sala 2022an de ev hersê berhemên min wê bên weşandin.

**Bi qasê ku min bihîstiye aliyekî te yê peykervaniyê jî heye. Ne wisa? Di vî warî de çi proje heye di deste te de niha?**

Belê gelek peykerên min çêkiribûn hebûn lê jiber nebûna atolyeyekê min li malê hemû berhemên xwe pêşkêş dikir. Qada min afirîneriyê dikir tenê odeya min bû û xebatên xwe min di wir de pêşkêş dikirin. Lê gelek caran dema ji bo bavê min êrîşê mala me kirin gelek berhemên min şikandin û gelekan jî birin. Wek proje jî ez dikarim bibêjim ne peykerên mînîmal, peykerên mezin min xêz kirine. Yanî yê herî biçûk dirêjbûna wî sê metre ye. Herî zêde di peykerande li ser şaristaniyên Kurdistanê disekinim û diafirînim.

Aniha ji bo pêşangehekê li ser peyker, hunera performansê û hunera dîjîtal dixebitim. Bila cemaeta hunerê li bendê be demeke nêzîk de ez ê van peykeran pêşkêş bikim.

**Tu bi galeriyekê hunerî re dixebitî an ji galeriyên hunerî daxwaza xebatê ji te re tên?**

Xebatên min li gelek galerîya hatin pêşkêş kirin.

Û ji gelek bajarên Ewrûpayê daxwaz ji min re hatin. Nû bi nû wext û derfetên min çêdibe ku bikaribim ji sînorên Batman, Kurdistan û Rojhilata Navîn derkevim. Bi vê derfetê ez ê gelek karên baş pêşkêş bikim.

Ji bilî vî di pêşerojê de dixwazim galerîyeke Kurd û kurdewarî vekim û ciwanên Kurd di vî warî de pêş bixim û proje û nivîsên xwe çap bikim û bixim xizmeta gelê xwe.

**Pirseke taybet bo te. Hunera te gelek hêja ye lê gelo tu dikarî pê debara xwe bikî an tu naxwazî berhemên xwe bifroşî?**

Di vê rewşê de bawer nakim hunermend, herî zede jî yên beşa wênesaziyê bikaribin der-



bara xwe bikin. Stranbêjek dikare derkeve sahneyekî di şevekê de pêncî sed hezar pere bistîne lê em nikarin. Yekem Kurd hê jî nehatine wê astê ku berhemeke em li dîwarên wan bibînin. Duyem jî ji ber pêvajoya li Tirkiyê, zimanê berhemên min zêdetir polîtîk e û peyamên civakî di hundirê xwe de dihewîne. Ji ber vê yekê li Tirkiyê na lê li bajarên Ewrûpa, Emerîka gelek xwestek çêdibin. Lêbelê dîsa jî ti debara min çênabe ger ku bi karekî din re mijûl nebim. An jî tiştekî ku pê debara xwe bikim tunebe wê ev pêvajo me daqurtîne. Hin berhemên min jî ji bo koleksîyonê ne, wana nafroşim. Lê bi gelemperî heke daxwaz hebe berhemên xwe difiroşim.

**Ez gelek spas dikim Hogir. Gotina te ya dawîn heye?**

Gotina min a dawîn birastî wê ji hemî pirsan re bibe bersiv. Ez ne hunermendê ku di nav tabloyeke tûwalê de girtî mame. Ez hunermendek im ku tim di keşfkirinê de, di afirandina tarz û stîleke nû de me. Ji ber vê yekê ez di navbera gelek dîsîplînan de rêwîtîyê dikim. Bi hunerê ez dikarim gelek bûyerên li welatê ez lê dijîm, bînim cem hev. Bi rastî, pirsgirêkek min heye. Ji ber vê yekê ez hez dikim ku bi materyalên cûda re bixebitim bi materyalên cûda bilîzim û wan bikim karên hûnerî. Şertê yekem ê vî karî ked, xebat, pir xwendin, wêrekbûn û jixwebawerbûn e. Pêwist e ku hûn vana bikin. Kesekî ku ji min re bû alîkar tinebû, ji hunermendên Kurdan bigire heta yên biyanî. Min hewl da, min pir hewl da. Îro jî ez li ser wê hewldanê disekinim. Lewma ev huner bû markayek û aniha gelek kes dixwazin bibin parçeyeke vê hunere. Çi hunermendên Kurd, çi yên biyanî. Ger serkeftineke min hebe ez bi welatê xwe re girê didim. Li ser min gelek danasîn hatine nivîsandin, katalog hatine çêkirin, bi sedan gotarên zanistî hene, ez hejmara wan nizanim. Mirov karekî hunerî bi zanistî dinirxîne. Ger destkeftiyek bi rengek çêkirî were zêdekirin an were darvekirin, hûn dikarin 1-2 salan bikin. Ev kedeke mezin dixwaze û ev keda diwazdeh salan e di vê hişmendîyê de me di vê sekne de me. Gelek caran ez hatim sûcdarkirin ji aliyê dewleta Tirk, gelek caran ez wek terorîst hatim pênasekirin. Gelek caran nasnameya min a hunerî hate binpêkirin ji aliyê dewleta Tirk ve. Lê bila Kurd, Tirk û gelên biyanî baş bizanibin ku ne wê ev hunera min biguhere ne zimanê min ne jî şexsîyeta min. Ez Kurd im û ji Kurdistanê me. Şanaz im, bi kêf û çoş im ku hunermendê Kurda me. Tenê daxwazeke min heye ji gelê Kurd: Nehêlin ku Alman, Îngilîz û Emerîkî ji we zêdetir hunera we bihesibînin û şîrove bikin û lêkolîn bikin. Hûn divê ji wan zehftir xwedî li hunermendên xwe derkevin, îro em sax in û me bi hezaran berhem pêşkêş kirin. Sibê kî dizane em ê di kîjan rewşê de bin. Belkî li girtîgehê û belkî jî kuştî, lê bo min her du jî serfirazî ye bila bo we jî wisa be.

**Saet xweş Hogir Ar.**

Gelek spas dikim, ligel silavên germ gelê xwe hembêz dikim.

# STARLINK ÇI YE?

## ÎNTERNETA RASTERAST A JI FEZAYÊ

DIGIKURD





Projeya Starlinkê dike ku girêdana înternetê hêsantir bibe. Bi xêra vê projeyê rasterast ji fezayê înternet tê girêdan. Îro li gelek welatan tora înternetê ya Starlinkê heye û xizmetê dide.

Starlink navê komeke peykên li asîmanan e û ji aliyê şirketa SpaceXê ya Elon Musk ve di sala 2015an de wek projeyê destpê kiriye. Ji wê demê heta niha gelek peykên ceribandinê dihatin şandin. Lêbelê di Îlona 2020an de êdî ev proje bi temamî ket rewacê. Vê koma peykan di navbera xwe û navendên xwe yên li erdê de pêwendiyek çêkiriye. Bi riya vê pêwendiyê înternet li asîmanan digere. Wekî tê zanîn tora înternetê li tevahiya dinyayê ji kabloyên mezin ên di binê okyanûsan de pêk tê. Starlink jî versiyoneke wê ya li asîmanan e.

Wekî di vê wêneyî de xuya dike înternet bes bi toreke hevpar pêkan e. Ev tor di bin okyanûsan de ji aliyê şîrketên taybet an jî dewletan ve hatiye avakirin.

Elon Musk bi projeya xwe ya Starlinkê zêdetir dixwaze kesên li çol û çolteran bigihîne înternetê. Li derdora tevahiya dinyayê dibe ku bi milyonan mîtro kablo hebin lêbelê hêj beşeke girîng a dinyayê nikare bigihêje înternetê.

Bi taybetî li çolter û deverên çiyayî peydakirina înternetê gelek bimesref û zehmet e.

Starlink înterneteke dîrekt a ji fezayê ye. Bi amûr û alavên antenê, her kesekî dûrî înternetê dikare xwe bigihîne înternetê.

Em bi kurtasî bibêjin Starlink înterneta rasterast a ji fezayê ye. Li fezayê li dora dinyayê bi sedan peykên Starlinkê hene. A niha nêzî 2 hezar peyk hene. Armanc di demeke kurt de şandina 12 hezar peykan e. Armanca dawîn jî bi temamî şandina 42 hezar peykan e.

Starlink di bazara înterneta fezayê de ne tenê ye lêbelê dibe ku pêşengiyê bike. Înterneta fezayê ji berê ve jî ji aliyê gelek şirketên taybet tê dayîn.

Înterneta ji Starlinkê li tevahiya Dinyayê ne aktîf e lêbelê gelek welatên Ewropayê û tevahiya Dewletên Yekbûyî yên Emerîka û Kanadayê dikarin xwe bigihînin vê xizmetê.

Li vê derê nexşeya înterneta Starlinkê heye û nîşan dide ku li ku derê înterneta Starlinkê heye.

Elon Musk di destpêka şerê Ukraynayê de ji rêveberiya Ukraynayê re bi dehan antenên Starlinkê şandin. Peykên Starlinkê li ser Ukraynayê hatin aktîfkirin û înterneta fezayê destpê kiribû.

Înterneta Starlinkê gelek caran ji înterneta bikablo bileztir e. Înternet li deverên ku dikişîne di navbera 75 megabît ~ 150 megabîtê de ye. Li hin deran digihêje 250 megabîtê jî. Bi riya ADSL û VDSLê hê jî li gelek cihên dinyayê înternet ne li ser 20 megabîtê ye.

Peykên Starlinkê bi roketên SpaceXê tên şandin fezayê. Elon Musk ji bo ku peyk li tevahiya dinyayê belav bibin carna bi xwe li fabrîkayan dixebite.

Ji bo ku xizmeta înternetê bê dayîn divê destûra welatan jî hebe. A niha Rûsyayê ev destûr nedaye şirketa Starlinkê.

Li ser Starlinkê gelek qisawet jî hene. Lewra bi hezaran peykên li fezayê temen-kurt in û wê di 10-20 salan de vemirin. Ev peyk wê bibin perçeyekî çopa fezayê. Şirketa SpaceXê niha li ser komkirina çopên fezayê planan dike.

Çopên fezayê ji bo keştiyên fezayê gelek xeternak in û dikarin keştiyan bixin xwarê jî.

Înterneta Starlinkê li deverên çalak mehane 110 dolar e. Ji bo carekê jî heqê sêl û modemê tê girtin û ew jî 599 dolar e.



# FESTÎVALA FÎLMÊN KURDÎ YA STENBOLÊ

## JI SÎNEMAHEZAN RE BÛ HENASEYEK

MEVLÜT OĞUZ*






**Duyemîn Festîvala Fîlmên Kurdî ya Stenbolê di navbera 24 û 29ê Adarê de li Stenbolê birêve çû. Di çarçoveya festîvalê de 28 fîlm hatin nîşandan. Rojnameger Mevlüt Oğuz ji bo The Hall Kurdî çavdêrî û nirxandinên xwe yên li ser festîvalê nivîsîn.**

Bajarê Stenbolê yê ku ji sê şehînşahiyên mezin re mazûvanî kiriye, bi qasî navendeke girîng a bazirganî û fînansê ye ewçend navendeke girîng ya geştyarî, çandeyî û hunerî ye û her diçe ev taybetmendiya wê zêdetir dibe. Stenbol, di sala 2010an de wekî paytexta çandê ya Ewropayê hatiye ragihandin.

Li Stenbolê bi milyonan Kurd dijîn, ango mezintirîn bajarê ku Kurd lê dijîn Stenbol e. Kurdan gelek kovar û rojname li vir derxistine, gelek sazî û organîzasyon li vir ava kirine.

Halê hazir navenda Weqfa Îsmaîl Beşikcî, Komeleya Lêkolînên Kurdî, Kurd-kav, Nûbihar û Avesta li vê derê ne lê ji bo şanoger û sînemakar û muzîsyenên Kurd sehneyeke taybet nîne, lewma hunermend û hunerhez têra xwe temasî hev nakin.


**FFKS: Li Stenbolê tekane festîvala fîlmên Kurdî**

Li gorî daneyên fermî yên sala 2019an li Stenbolê 894 salonên sînemayên hene. Rojane bi dehan-bi sedan çalakiyên çandî, hunerî û ferhengî yên xwecihî û navnetewî pêk tên; fuar, bienal, trienal; Festîvala Navnetewî ya Stenbolê, Festîvala Fîlmên Gerok, Festîvala Fîlmên Serbixwe ya IF Istanbulê, Festîvala Navnetewî ya Bogaziciyê, Festîvala Fîlmên Karkeran, Festîvala Fîlmên Tawanbariyê û hwd. Bi dehan festîvalên bi vî rengî tên lidarxistin. Di nava ewqas festîvalan de tenê festîvaleke fîlmên Kurdî heye û îsal di sala 2022yan de bo cara duyem hat lidarxistin.

Duyemîn Festîvala Fîlmên Kurdî ya Stenbolê (FFKS) di navbera 24 û 29ê Adarê de pêk hat. Cara pêşî beriya pandemiyê, di 2019an de hatibû pêkanîn. Piştî demeke dirêj, festîval bo me, bo sînemahez û dildarên Kurdî wekî henaseyekê bû. FFKS, bi pêşengiya Kolektîfa Sînemayê ya Mezopotamyayê hat lidarxistin û 5 rojan berdewam kir. Di wan pênc rojan de, me têra xwe fîlm û belgefîlm temaşe kirin, betnê me bi sînemayê têr bû.

FFKS, li Navenda Çandê ya Cemîl Candaş a li navçeya Şişliyê, bi fîlmê 'Kurdên Êzîdî' û konsera Koma Aryen destpê kir û bi fîlmê 'Namo' bidawî bû. Piştî fîlmê dawî yê festîvalê, gotubêjek bi derhênerê fîlmê Namo, Nader Saeivar re hat kirin.

Derhêner Saeivar li ser pirsekê diyar kir ku wî bi budçeyeke piçûk, bi 5 hezar dolaran fîlmê Namo kişandiye. Saeivar di fîlmê Namo de ku behsa jiyana Kurdan dikir, alîkarî ji Cafer Penahî wergirtiye. Derhêner



Saeivar, bi fîlmê Namo bi me dide xuyakirin ku bi budçeyeke nîsbeten piçûk jî mirov dikare fîlmekî serkeftî bikşîne.

Di çarçoveya festîvalê de 28 fîlm hatin nîşandan. Ji wan 13 kurtefîlm, 9 belgefîlm û 5 fîlmên metraj bûn. Tevî ku festîval li sînemayeke butik a bi navê Sinemajesticê bû eleqeyeke gelekî zêde ya welatiyan bo festîvalê hebû.

Bi nêrîna min eger fîlm, li Sînemaya Atlasê yan jî li Sinemaya Beyogluyê bihata nîşandan, dibû ku zêdetir eleqe jî hebûna lê bi qasî ku min şopand, di her seansê de salon tije bûn, heta carinan xelk ji devê derî jî vegeriyan.

**Komîteya amadekar a festîvalê bi cil û bergên Kurdî amade bûn**

Di merasîma destpêkê û vekirinê de, komîteya amadekar, ango hevalên berpirs bi cil û bergên Kurdî amade bûn. Di Newrozê de hêzên ewlehiyê li hin cihan nehiştibûn ku Kurd bi cilên herêmî bikevin qada Newrozê -bo nimûne peyamnêrê K24ê li Amedê, Hesen Kosen nehiştibûn ku bi cilûbergên Kurdî bikeve qada Newrozê- amadekarên festîvalê, bi mebesta ku cil û bergên Kurdî zêdetir bêne xuyakirin û qedexeya li dijî cilûbergên Kurdî bê şermezarkirin, ev yek pêk anîbûn.







**Mijarên fîlmên festîvalê ev bûn: êş û janên Kurdan, êşa şer, derbiderî û trajediyên Kurdan**

Bi giştî mijarên fîlmên festîvalê ev bûn: êş û janên Kurdan, êşa şer, derbiderî û trajediyên Kurdan bûn lê bi min fîlmek hebû ku ji van vediqiya, ji wan fîlmên din cudatir bû. Fîlmê Rêber Doskî. Fîlmê Doskî yê bi navê 'Sidîq û Panter'. Doskî, bi vî fîlmî wêneyekî din yê Kurdistanê nîşanî me dide. Fîlmê wî û ekterê wî Sidîqê jîngehparêz mîna Donkîşotekî parêzbendiya dar û daristan, teyr û tilûrên Kurdistanê dikir….Em di fîlmên Kurdî, gelek caran dîmenên bedew yê xwezayê Kurdistanê dibînin lê ez dikarim bêjim ku Sidîq û Panter fîlmekî wisa ye ku methê xweza, ekolojî, floraya Kurdistanê dike. Di nava fîlmên festîvalê de favoriya min ev fîlm bû.

Herwisa lîstikvaniya Hisên Hesen, Feyyaz Duman û Mina Ozlem Sagdic a di fîlmê "Fîlmê House Without Roof" (Xaniyê Bêban) gelekî serkeftî bû.

**Festîval bi pêşengiya Kolektîfa Sînemayê û hevkariya gelek sazî û înîsiyatîfan pêk hat**

Ligel Kolektîfa Sînemaya hevkariya gelek sazî û înîsiyatîfan hebû. Yek ji wan jî Komeleya Lêkolînên Kurdî ya Stenbolê bû. Axiftinên ji bilî Kurdî, bi jêrenivîsa (subtitle) Kurdiya Kurmancî hebû û ew jêrenivîs gelekî bi rêk û pêk bûn. Hevalên Komeleya Lêkolînên Kurdî jêrenivîs sererast kiribûn, bandor û alîkariya wan şayanî pesindayînê ye.

Herwisa min divê bibêjim ku, performansa Koma Aryen gelek baş bû. Komê, roja yekem, di nîşandan fîlmên Kurdên Êzîdî de, bi awayekî zindî, ji serî heta binî ji fîlmî re muzîk çêkirin, ew jî şayanî behsê û pesindayînê ye.

Wek rojnameger û bînerekî, festîval, bi her awayî bi dilê min bû, heta ji min hat, min gelek fîlm temaşe kirin, lê min dixwest fîlmên hin derhênerên din ên wekî Şewket Emîn Korkî, Mehmet Alî Konar, Ali Kemal Çinar û Aram Dildar jî bihata nişandan.

**Li festîvalê nebûna xelatekê wekî kêmasiyekê derdikeve pêş**

Festîval hinkekî jî bi xelatên xwe û nirxandina li ser xelatan dibin nûçe û rojev. Wekî temaşevan û meraqdarekî sînemayê min dixwest hin xelatên cûr bi cûr bihata dayîn. Nebûna xelatekê, wekî kêmasiyekê derdikeve pêş. Bi hêviya ku sala bê, naverok berfirehtir be û cure cure xelat bên dayîn.

Bi kurt kurmancî, Festîvala Fîlmên Kurdî(FFKS) jî di nav de, sînema û festîval gelekî bi mesref in. Eger piştgirî û sponsoriyên zêdetir bo festîvalê hebin dê baştir û geştir bibe lê eger bi vî awayî dewam bike sala bê dibe ku kêmasiyên îsal bêne sererastkirin lê dîsa jî ji festîvalekê bêhtir wê wekî hefteyeke pêşandana fîlmên Kurdî berdewam bike.

Wekî encam, her çi dibe bila bibe, bi saya festîvalê kedkarên sînemayê derfetê dibînin ku kar û barên wan bêne nîşandan. Bi saya festîvalan sînemakar û bîner hev dibînin, suhbet û nîqaşên li ser sînemayê dikin. Bi hêviya ku FFKS gelek salan berdewam bike û bibe yek ji festîvalên sereke yên Kurdan û Stenboliyan.



***Mewlûd Oguz (Mevlüt Oğuz)**

Rojnameger / Stenbol

oguzmevlut@gmail.com, @mevlutoguz

Bi eslê xwe ji Heskîfa Batmana Bakurê Kurdistanê ye. Lîsansa xwe li Zanîngeha Firatê di beşa dîrokê de temam kiriye. Di ber re civaknasî û wêje xwendiye. Helbest û nivîsên wî di kovarên wekî Pêngav, Çirûsk, Kovara W, Nûbihar, Bar Helbest û gelek kovaran de hatine weşandin. Edîtorîya kovara muzîkê ya Ziryabê kiriye. Piştî ku di kovar, rojname û malperên cur bi cur de nivîsîye, di sala 2017an de bi awayekî profesyonel dest bi karê rojnamevanîyê kirîye û ji bo sazîyên ragihandinê yên navdewletî yên wekî Sputnik û WDR Cosmoyê edîtorî û peyamnêrî kirîye. Li Podcast Kurdîyê bernameyeke çandî, hunerî û edebî bi navê Derkenar amade û pêşkêş kiriye. Ji Tîrmeha 2020an û vir ve li Weqfa Îsmaîl Beşîkcî wekî berpirsê ragihandin û medyayê kar dike. Ji Sibata 2022yan ve li Zanîngeha Ibn Haldun bi awayekî nîvdemî dersên kurdî dide xwendekarên master û doktorayê. Nîsana 2022yan bûye wergêrê sondxwarî yê Kurdî. Herwiha ew endamê Federasyona Rojnamegerên Navnetewî (IFJ) û PENa Kurd e.

# PARKA KEUKENHOFÊ

ENÎS DURSUN

Xwînerê The Hall Kurdî

edursun571@gmail.com

Hollanda ku yek ji wan welatan e ku di cîhanê de herî zêde turîst serlêdanê dikin (qesta wê dikin) û Keukenhof ji bo van turîstan di demsala biharê de cihê herî zêde tê ziyaretkirin e. Ji bo du mehan salane mîlyonek û nîv ziyaretvan dikişîne.



Parka Keukenhofê ne tenê li Hollandayê lê li cîhanê jî baxçeyê biharê yê herî xweş tê hesibandin. Parka ku hûn dikarin her sal ji dawiya Adarê heya dawiya Gulanê tenê 8 hefte serdana wê bikin; bi hezaran laleyan, baxçeyên bi têgehên cuda hatine amadekirin, pavyonên ku çalakî lê tên lidarxistin li benda hezkiriyên kulîlkan in. Ka em bi dîroka Parka Keukenhofê destpê bikin, em li hemî agahdariya ku hûn hewce ne binihêrin, wek mînak; meriv çawa bigihîje wir, bihayê bilêtan çi ne, û dema çûyînê ya herî xweş.

**Di vê gotarê de hûn ê çi bibînin?**

1-Cihê laleyan di aboriya Hollandayê de

2-Dema laleyan li Holandayê

3-Diroka Parka Keukenhofê

4-Avahiya Keukenhofê

5-Parka Keukenhof li ku ye û meriv çawa diçe wira?

6-Divê ez kîjan demê biçim serdana Parka Keukenhofê?

7-Bihayên bilêtên Parka Keukenhofê

8-Nexşeya Parka Keukenhofê



**Cihê laleyan di aboriya Hollandayê de**

Li gor amarên aboriya 2019an a Hollandayê bi 94,5 mîlyar Euroyan li cîhanê di rêza duyemîn a hinardekirina çandiniyê de ye. Berhemên sereke yên ku Hollanda difroşin cîhanê hilberên xwarinê, ampûl û nebat in. Li gorî hejmarên fermî berhemên herî mezin ku Hollandayê di sala 2019an de herî zêde hinarde kirine kulîlk û nebatên xemilandinê ne. Bi 9,5 milyar Euroyan di rêza yekem de ne. Bi dîtina van jimareyan, ew nîşan dide ku hinardekirina kulîlkan ji bo Hollandayê, bi taybetî çiqas girîng e.

**Dema laleyan li Hollandayê**

Demsala laleyan ku her sal li Hollandayê di dawiya meha Adarê de destpê dike, heya dawiya Gulanê didome. Yek ji cihên herî xweş ên ku hûn dikarin vê serhildana rengan a 8 hefteyî lê bibînin Parka Keukenhofê ye, ku wekî baxçeyê herî xweş ê biharê yê cîhanê tê zanîn. Ev parka ku di heman demê de di nav Rêya Laleyan de ye ku wek yek ji baştirîn rêyên cîhanê tê nîşandan, bi angaşt(îdia)a ku li dinyayê bexçeyê herî xweş ê kulîlkan e hat avakirin.

**Diroka Parka Keukenhofê.**

Tê zanîn ku di sedsala 15an de li vê herêmê dehl û daristan hebûn û girikên qûman bû. Erdên Bavyera Countess Jacob of Gennegau (Jacoba van Beieren (1401-1436)) bûn. Daristana derdor wekî çavkaniya nêçîra ajalan, kivark, ber û

giyayan, li qada nêzî kelehê ji bo çandina fêkî, giya û giyayên metbexê dihat bikaranîn. Navê “Kukenhof” ku ji Hollandî wekî “Baxçê Metbexê” tê wergerandin, ji vir tê. Keukenhof, di sala 1641ê de hatiye avakirin û rûbera derdora wê ji 200 hektarî derbas dibe. Di 1857an de, Baron Van Pallandt mîmarê perestgehê Jan David Zocher û kurê wî Louis Paul Zocher wezîfedar kir ku qada dora kelehê sêwiran bikin. Di dema danîna parkê de prensîbên klasîk ên avakirina parka îngilîzî hate bikaranîn. Ev park bi şêwaza perestgeha îngilîzî hîn jî bingeha Keukenhofê pêk tîne. Di sala 1949an de, komek ji 20 hilberînerên pêşeng û hinardekarên ampûlê plansaziyek çêkir ku erd wekî pêşangehek ji bo ampûlên ku biharê şîn dibin bikar bînin. Parek sala paşîn di sala 1950an de ji gel re vebû û ew serkeftinek mezin bû, tenê wê salê 236,000 ziyaretvanên wê hebûn. Di van 72 salên dawîn de, Keukenhof bûye nîşanek navdar a cîhanê.

**Avahiya Keukenhofê**

Parka Keukenhofê li bajarê Lisse, nêzîkî Amsterdamê ye, û zêdetirî 32 hektar baxçeyên xweşik hene: heya 7 mîlyon nebat (ji wan 100 cûreyên cuda hene, ku ji wan nêzîkî 4,5 mîlyon lale û sumbul in) hene û nêzîkî 90 cureyên daran hestek bêdawîtiyê, hestek li bihuşta kulîlkan diafirînin. Ev heybetiya kulîlkan ji hêla 100 pargîdaniyên beşdar ve hatî çêkirin ku katalogên xwe yên zindî nîşan didin. 500 cotkar li zêdetirî 20 pêşandanên kulîlkan cûrbecûr gulên birîn û nebatên kulîlkan pêşkêş dikin. Park ji sê serayan pêk tê: Paviliona Willem-Alexander zambakan, nêrgiz, sumbul, nebatên di încaneyê de hene. Di Paviliona duyemîn de (Oranje Nassau) freesia, gerbera, gul, laleyên, irises, alstroemerias, daffodils, chrysanthemums, calla û karanfi hene. Paviliona sêyem a Beatrix ya bi orkîde, pavilyona kesane ya Prensesa Hollandayê ye. Di nîvê parkê de hewzek heye ku qubebaz û teyrên din ên avê lê dijîn. Bi tevahî dirêjahiya hemî rêyên meşê bi qasî 15 km ye. Li kêleka rêyan peykerên hosteyên biyanî û Hollandî yên serdemên cihê hene. Weke Key (Qral), Kervel, Vermeer, Bruning, Alexander Taratynov. Li ser erde parkê gelek gol, gola avjenîyê, çem, kanal hene. Piraniya wan bi keştiyan têne gihîştin. Zêdeyî 40 pir û peyayan qeraxên gol û kanalan bi hev ve girêdidin. Di parkê de cotxaneyek heywanan, Pavilion Royal Hats, Pavilion Tea English, kompleksa şahiyê ya Bollebozen, xwaringeh, kafe û cihê parkirinê jî hene. Bi navînî, meşa li parkê bi kêmî ve 3 demjimêran digire, lê ev dem dê ji bo nasîna kulîlkan û bedewiya wan têr neke.

Di van 69 salên dawîn de, Keukenhof bûye nîşanek navdar a cîhanê. Di parkê de aşê bayê jî heye. Ew di sala 1892yan de li bajarê Groningenê hate çêkirin û di eslê xwe de mebesta kişandina avê ji deverên deryayî yên nizm hebû. Di sala 1957an de, Holland American Line melkeba bayê kirî û diyarî Parka Keukenhof kir. Avahiya ku di sala 2008ê de hat nû kirin, niha wekî muzexane dixebite. Ezmanê zelal, ku her kes dikare li avahiya hundurîn a bayê klasîk a Hollandî temaşe bike.






**Parka Keukenhofê li ku ye û meriv çawa diçe wira?**

-Keukenhof bi qasî 40 kîlometreyan li durê Amsterdamê ye. Hûn dikarin bi kirêkirina gerîde(erebe)yê, bi bîsîklêtê, bi veguhastina giştî ya ji Amsterdamê an jî bi kirîna gerokek pakêtê biçin Keukenhofê.

-Heke hûn bi wesayîta xwe an bi bîsîkletê biçin, hûn dikarin bikaranîna otobanên A4 an A44 bigihîjin wir.

-Heke hûn bi veguhestina gelemperî werin; Hûn dikarin otobusên rasterast ên ji navenda bajarê Amsterdam, Balafirgeha Shiphol an jî Harleemê diçin, bi kar bînin.

-Dema ku hûn bilêtên Keukenhofê bikirin, hûn dikarin bilêtek hevgirtî di forma otobus + bilêta têketinê de bikirin.

-Ger hûn di demsala laleyan de çûne Amsterdamê, hûn ê gava ku hûn li bajêr digerin gelek ajansên ku gerên Keukenhofê difroşin bibînin. Hûn dikarin yek ji wan hilbijêrin.

**Divê ez çiqas dem biçim serdana Parka Keukenhofê?**

Ez ji we re pêşniyar dikim ku hûn bi kêmanî nîvê rojê veqetînin ku hûn biçin parkê, û heke mumkin be, serê sibê zû werin. Bilhasa heke hûn dawiya hefteyê biçin, malbatên bi zarok danê nîvro dest bi hatina xwe dikin, ji ber vê yekê baş e ku hûn biçin deverên ku hûn dixwazin bibînin berî ku ew werin. Yan jî piştî ku ger û malbat diçin, yanî piştî saet 16:00an hinekî bêdeng dibe.

**Buhayên bilêtên Parka Keukenhofê ji bo 2022yan wiha ne:**

-Mezinan: 18,50 €

-Zarok (4-17 salî) bihayê bilêtê: 9 €

-Kom (20 kes û zêdetir) bihayê bilêtê: 17 €

-Bihayê hevgirtî (Otobus û bilêt)

-Ji Amsterdam RAI


Bilêta Combi ya Mezinan 33,50 €

Bilêta Combi ya Zarokan (4-17 sal) 15,50 €

Ji bo zarokên heta 3 salî belaş e.

-Bilêtên hevgirtî di forma otobus + bilêta têketinê 33,50 € ji navenda Amsterdamê, 29,50 € ji balafirgeh û Harleemê ne.

-Parka otomobîlan, 6 €




►Nexşeya Veguhestina Parka Keukenhofê.

# Koma Kovargerên Kurd

Koma Kovargerên Kurd bi hêvîya kovargerên kurd bîne ba hev, bingeheka sazgehiyê bide kovargerîya kurdî, kovargerîya kurdî hem bi sêwirandinê hem bi naverokê bi pêş da bibe û pirsgirêkên kovarên kurdî bi hev ra çareser bike hatîye damezirandin.

## Kovarên Endam




/KovargerenKurd

KovargerenKurd@gmail.com

**The Hall Kurdî**

Endama Koma Kovargerên Kurd e